Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :833 27-Kanûn- 2021 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Berxwedana Kobanê ji bo parastina mirovayiyê cîhan tev kir yek

## Dîroka xiyanata PDKê xwe dubare dike

Jiyan BOZO/Amûdê

Bi salan e PDK li dijî gerîlayên Kurdistanê şerê birakujiyê dike. Ji bo berjewendiyên xwe yên malbatî û dostayiya bi dewleta tirkî ya dagîrkere, bi sedan keç û xortên Kurd şehîd xistin.

Nûjîn û Sason Amûdê yên ji heman malbatê, du mînak in ku bi destê PDKê şehîd bûne. Ji gundê Sinceqa Hecî Sadûn yê Amûdê tenê 4 gerîla bi destê heman partiyê şehîd bûne.

Nasnameyên van şehîdan wiha ne:

Nav û Paşnav: Rohat Nesrî Silêman. Navê Tevgerê: Nûjîn Amûdê. Cî û dîroka bûyînê: 1973. li Sinceqa Hecî Sadûn ya Amûdê. Cî û dîroka Şehîdbûnê: 1998 li Xakurkê.

Nav û Paşnav: Yûsiv Îsmaîl Silêman. Navê Tevgerê: Sason Amûdê. Cî û dîroka bûynê: 1975 li Sinceqa Hecî Saidûn ya Amûdê. Cî û dîroka Şehîdbûnê: 1992 li Şkefta Birîndaran ya li herêma Zapê.

**“BI ÇI MAFÎ XWÎŞKA MIN ŞEHÎD KIRIN”**

Têkildarî mijarê birayê şehîd Nûjîn, Tewfîq Nesrî Silêman wiha axivî: “Şehîd Nûjîn sala 1995an derbasî çiyê bû. Bi şahî û serbilindiyeke mezin çû. Dema çû bavê min jê re wiha got: “Ev rê riya şeref û rûmetê ye. Zor û






zehmetiyên wê pir in. Ez bi te serbilind im, lê xiyanetê qebûl nakim.” Nûjînê soza berxwedan û têkoşînê da û çû. Nûjîn tim digot; li hevalên min xwedî derkevin, çay û qehweyê nedin wan, mîda min ji ber wan xerab bû. Bila deriyê we ji partiyê re tim vekirî be. Sê salan li çiyê ma û şehîd bû. Şehadeta wê pir biêş bû. Çimkî bi destê kesên qaşo em dibêjin birayên me ne şehîd bû. Lê tiştekî wan û kurdîtiyê bi hev re nîne. Nûjîna min sala 1998an li Xakûrkê di êrişa çeteyên PDKê de dema dixwaze hevalê xwe yê birîndar xilas bike, şehîd dibe. Bi çi mafî xwîşka min şehîd kirin.”

**“EMÊ HETA DAWIYÊ ŞOPDARÊN ŞEHÎDÊN XWE BIN”**

Tewfîq Nesrî Silêman axaftina xwe wiha qedand: “Çawa dikarin serê xwe rakin û bêjin em Kurd in. Kurdiyatî ji wan berî ye. Van namûs û rûmeta xwe firotiye. Dilê bi hezaran dayîk û bavan şewitandin. Dîrok vê xiyanetê ti carî ji bîr nake. Ji bo berjewendiyên xwe Kurd û Kurdistan tev firotine. Gotineke pêşiyan heye, dibêjin; “Filankes mîna kewê dijminê qewmê xwe ye.” PDK jî dijmina gelê xwe ye. Ji bo wê divê em li dijî şerê birakujiyê derkevin. Niha jî dixwazin şerê birakujiyê derxin û gerîlayên me tine bikin. Lê bila baş bizanin ku ti hêz nikarin me tine bikin. Kezeba me şewitî bila kezebe kesên din neşewite. Emê heta dawiyê şopdarên şehîdên xwe bin. Welatekî azad û serbixwe ava bikin.”





**JI BIRAKUJIYÊ RE ÊDÎ BES E**

Xwîşka şehîd Sason, Mamoste Seîda Îsmaîl Silêman jî wiha axivî: “Bi salan e PDK li hemberî zarokên me şerê birakujiyê dike. Sala 1992yan PDKê bi hevkariya dewleta tirkî ya dagîrker êrişî gerîlayên Tevgera Azadiyê kir. Di wan êrişan de bi sedan heval şehîd bûn bi sedan jî birîndar bûn. Di nava birîndaran de birayê min jî hebû. Ji bo ku heval birîndarên xwe bigihînin ciyekî ewle, tevan dibin şkeftê. Lê mixabin çeteyên PDKê ciyê şkeftê nas dikin û bi awayekî hovane wan hevalan şehîd dixin û heta niha jî cenazeyên wan nehatine dîtin. Ji birakujiyê re êdî bes e. Sedema bindestiya me şerê birakujiyê ye. Ev şer berjewendiya dijminê Kurdan pêk tîne. PDK bûye lîstoka destê dijmin. Herwiha ji bo berjewendiyên xwe yên malbatî van êrişan dike. Lê bila baş bizanin ku dewleta tirkî hebûna Kurdan bi giştî napejirîne û Kurdan tevan dike hedefa xwe.”

**“XAYÎNAN Û HEVKARÊN DAGÎRKERAN JI XAKA ME DERXIN”**

Seîda Îsmaîl Silêman bi van gotinan axaftina xwe bi dawî kir: “Hovîtiya PDKê ne kêmî ya DAIŞê yê. Kurdê ku birayê xwe bikuje mafê wî nîne bêje ez Kurd im. Birayê min yê birîndar bi dastê wan şehîd bû û cenazeyê wî jî ne xuya ye. Mafê me ye em welatekî azad ava bikin. Lê ev xwefiroşên mîna PDKê xencera di piştê de ne û vî welatî radestî dijminan dikin. Banga min ji her kurdî re heye; yekîtiya xwe çêkin, xayînan û hevkarên dagîrkeran ji xaka me derxin. Me ji bo vê xakê bi hezaran şehîd dane, mafê ti kesî nîne li ser keda wan bijî.”

*SAMIR OSMAN/ANHA*

**Berxwedana dîrokî ya di kuçe û kolanên Kobanê de nîşan da ku cîhan dikare ji bo parastina mirovayiyê û kurdistanî jî ji bo parastina doza xwe bibin yek. Herwiha da xuyakirin ku îradeya bihêz û çanda girêdana bi xakê ve dikare serkeftinê misoger bike.**



26’ê Çileya 2015’an şervanên berxwedêr Yên li Kobanê serkeftina li dijî DAIŞ’ê ragihandin. Serkeftina berî 6 salan li Kobanê hatî ragihandin, ne serkeftineke normal bû. Li Kobanê mirovayî li hemberî terorê bi ser ket, sînor hatin rakirin û cîhan li hemberî xetera herî mezin bû yek. Li Kobanê nîşanên yekîtiya kurdistanî xuya bûn ku armanc jê parastina xakê û dozê bû. Herwiha Ereban destê xwe xist destê Kurdan û rêgezên nijadperestî û şovenîst yên ku pergalên serdest afirandine, rakirin û serkeftina dîrokî li Kobanê ragihandin.

**LI KOBANÊ YEKÎTIYA KURD Û EREBAN**

Di destpêka şerê Sûriyê de, lîstina bi rayên etnîkî û mezhebî derket pêş ku bû sedema rijandina xwîna bi hezaran mirovan. Lê berî 6 salan û di nava kolanên bajarê Kobanê de Kurd û Ereban nîşan da ku têkiliyên wan dîrokî ne û bi îdiayên derve naxapin. Di wê demê de Odeya Çalakiyan ya Volkana Firatê ku ji komên Ereb, YPG û YPJ’ê pêk dihat, ala pêşengiya şerê li dijî DAIŞ’ê hilda.

Endamê Meclisa Rêveber ya PYD’ê yê herêma Firatê Ehmed Şêxo li ser mijarê wiha axivî: “Dijminên azadiyê xwestin bi belavkirina fikrên tundrew ronesansa fikrî ya gelê Sûriyê tine bikin da ku armancên xwe pêk bînin û li hin cihan jî cihê xwe çêkin. Lê gelê Kobanê qebûl nekir ku cilên reş li xwe bike. Li ser vê berxwedan ragihand heta gihîşt serekfinê.”

Şêxo diyar kir ku Rêveberiya Xweser ku xwe dispêre projeya neteweya demokratîk ku li gorî wê jiyana hevbeş û biratiya gelan hatine avakirin, li dijî tundrawiyê ne û wiha got: “Ji ber vê yekê xwestin vê projeyê tine bikin. Lewre bawer dikirin ku kilîta Rêveberiya Xweser li bajarê Kobanê ye. Ji ber wê bajar kirin armanc da ku fikirê azad tine bikin.”

**JI BAKUR BAHOZA PIŞTGIRIYÊ**

Piştî ku gund û bajar yek bi yek ketin destê DAIŞ’ê û xeter nêzî bajêr û xelkê wê bû, rêber Abdullah Ocalan di girtîgeha Îmralî de banga seferberiya giştî, serhildanê û piştgiriya Kobanê li kurdistaniyan kir.

Bi vê bangê re, serhilana gelê Kurd li bajarên bakurê Kurdistanê û Tirkiyê dest pê kir. Bi hezaran mirov daketin qadan û bang li dewleta tirkî kirin ku dorpêça li ser bajarê Kobanê rake da ku destekê ji Bakur bigire.

Di wê serhildanê de gelek serhildêr ji ber êrişên hikumeta tirkî şehîd bûn. Dewleta tirkî operasyonên girtinê li dijî kesên beşdarî çalakiyên xwedîderketina li Kobanê bûyîn, hê jî didomîne. Di wê demê de bi sedan ciwanan têlên sînor qetandin û cihê xwe di parastina Kobanê de girtin. Herwiha bi sedan sînorê bakurê bajêr parastin da çeteyên DAIŞ’ê ji wî milî ve derbas nebin.

Fermandarên eniyên berxwedana Kobanê diyar kirin ku desteka ji Bakur gihîştî Kobanê, roleke gelek bibandor di serkeftina li dijî DAIŞ’ê de lîst.

Endamê Desteya Hevserokatiya PYD’ê Salih Muslim jî li ser vê mijarê wiha got: “Bi qasî serkeftina me ya li Kobanê, birîna dijmin giran bû. Wekî niha hûn dibînin; piştî 6 salan ji serkeftina Kobanê desthilata tirkî kesên piştgirî dayîn berxwedana bajêr û xwepêşandan li dar xistîn û kesên li ser sînor li rex gelê Kurd yê Kobanê sekinîn, digire. Di demekê de ku em bi serkeftinê şad bûn, dijminê gel, azadî û mafên mirovan ji vê serkeftinê hêrs bû.”

**‘PKK’Ê LI KOBANÊ PARASTINA MIROVAYIYÊ KIR’**

Mîna li Şingalê kirîn, bi sedan gerîlayên PKK’ê herikîn Kobanê û tevlî berxwedana li dijî DAIŞ’ê bûn. Çend hefte beriya şerê li Kobanê dest pê bike, gerîlayên PKK’ê bi hawara Şingalê ve çûn ku hêzên PDK’ê jê vekişiyan û şêniyên wê li pêşberî Fermana 73’yan tenê hiştin.

Gerîlayan bi hezaran mirovên Êzîdî ji pencên çeteyên DAIŞ’ê xilas kirin. Bi vê yekê qada duduyan ya ji bo wan Kobanê bû.

Salih Muslim got; ji bo ku Kobanê di têkoşîna li hemberî hêzên tarî de bibe rastiyeke mutleq, diviya cîhan tev piştgiriya wê bike. Ji bilî vê, partî û hêzên siyasî û leşkerî li kêleka vî bajarê ku tevahî mirovahiyê diparêze, sekinîn.”

Muslim diyar kir ku ne Kurd tenê, di heman demê de ji tevayia cîhanê parêzvanên mirovayî û azadiyê li kêleka Kobanê sekinin. Lê Kurdan ji bo pêkanîna vê armancê û yekkirina gelan û hildana ala demokrasî û azadî, şehîd dan.

## Quncika têgînan

| | |
|---|---|
| Damezirandin | Avakirin, sazkirin: Salvegera damezirandina Komara Kurdistanê. |
| Damezirîner | Kesê ava kirî: Damezirînerê komarê li meclisê sond xwar. |
| Diyarker | Kesê ku tiştekî dide zanîn. Xuyaker, ronker, zelalker, ragihîner. |
| Hevrê | Kesên ku hizir û baweriya wan weke hev. Bi taybetî di siyasetê de. |
| Mayînde | Tişta ku demdirêj dimîne. Xurt, qayîm. |
| Pejirandin | Qebûlkirin. Pejirand, ango qebûl kir. |
| Rêxistin | Komek mirovên ji bo heman armancê bi hev re dixebitin. Organîzasyon, sazûman, teşkilat, kom, partî, hizb |
| Senato (îtalî) | Li hin welatan li gorî temen û perwerdeya endamên parlamentoyê, meclisa hatî avakirin. Ciyê ku senator lê kom dibin. |
| Senator (îtalî) | Endamê senatoyê. |
| Tengav | 1. Ciyê teng yê av tê re derbas dibe. 2. Kesê ji bo tiştekî ketî tengiyê: Ez ji bêperetî tengav bûme. Kesê destava wî ya piçûk tê. |

## Navên şehîd û birîndarên di êrişa artêşa tirkî ya ser Til Rifet de eşkere bûn





Artêşa tirkî ya dagîrker li Til Rifet komkujiyeke din kir. Navên kesên di êrişa artêşa tirkî ya dagîrker ya ser navçeyê de şehîd û birîndar bûyîn, eşkere bûn.*R-2*

## Derar: Astana xeta şoreşê guhert, komîteya destûrî jî temenê hikumeta Şamê dirêj dike



Hevserokê MSD’ê got; encama civînên Astana xeta şoreşa Sûriyê guhert û diyar kir ku komîteya destûrî binketî ye û temenê hikumeta Şamê dirêj dike. *R-4*

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 833 27-Çile- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## Bêrîvan Xalid: Jinan mohreke diyarker li Rêveberiya Xweser xist



Bêrîvan Xalid got; rola jinan di Rêveberiya Xweser de diyarker û şênber e. Jinên ku di Rêveberiya Xweser de cih digirin, jinan teşwîq dikin ku rola xwe di civakê de pêk bînin. Bêrîvan Xalid diyar kir ku têkoşîna parastina destkeftiyên jinan û xilasiya ji zihniyeta desthilatdar dewam dike. *R-3*

# Du jinên pêşeng Seide û Hind

Kevneperest di azadiya jinê de mirina xwe dibinin. Ji bo wê di hedefa wan de her tim jinên pêşeng û rojakbîr hene. DAIŞ, ku ji gemara Rojhilata Navî hatiye afirandin û nûnertiya kevneperestiya cîhanê dike, ji destpêka derketina xwe ve bi awayekî xwînxwarî êrişî jinan dike. Bi taybetî jinên zana û pêşeng. Şeva Înê hevseroka meclisa bajarokê Til El-Şayir yê girêdayî navçeya Deşîşa ya başûrê kantona Hesekê Seida Feysel El-Hermas û cîgira wê Hind Letîf El-Xidêr ji aliyê heman hovan ve hatin revandin û kuştin. Koordînasyona Kongreya Star diyar kir ku êrişa hatî kirin ji bo şkandina vîna jina azad e. *R-3*










## Şehîdên komkujiya Til Rifet hatin veşartin.

» Şêniyên Efrîn û Şehbayê bi merasimeke girseyî dayîka Nazliye Mihemed Mustefa li goristana Fafînê ya Şehîdan spartin axê. Her du zarokên Majêd Yasêr Sekran yê 5 salî û Abdulmuhsên Sekran ê 12 salî jî li bajarê Til Rifetê hatin veşartin. *R-5*



## Pirsgirêka xeta petrolê ya li Tirbespiyê hat çareserkirin

» Werşeyên xebatê yên xetên petrolê pirsgirêka di boriya petrolê ya li herêma Cerih ya girêdayî navçeya Tirbespiyê de, bilez çareser kirin. *R-6*



## Li Şehba pêşangeheke hunerî

» Komîna Sînemayê ya herêma Efrînê bi hevkariya MSD’ê pêşangeheke wênesazî û peykersaziyê li hola Lîstokan ya kampa Serdemê vekir. *R-7*

# Navên şehîd û birîndarên di êrişa artêşa tirkî ya ser Til Rifet de eşkere bûn

Artêşa tirkî ya dagîrker li Til Rifet komkujiyeke din kir. Navên kesên di êrişa artêşa tirkî ya dagîrker ya ser navçeyê de şehîd û birîndar bûyîn, eşkere bûn.



Artêşa tirkî ya dagîrker û çeteyên wê roja Şemiyê êrişî navçeya Til Rifet ya kantona Şehba kirin.
Ajansa nûçeyan ANHA navên 3 sîvîlên di topbaranê de şehîd bûyîn, bi dest xistin. Navên wan wiha ne; Nazliye Mihemed Mistefa û her du zarokên bi navên Macid Yasir Sekran (5) û Ebdulmihsên Sekran (12).
Li gorî agahiyan, Nazliye ji koçberên Efrînê ye û tevî malbata xwe piştî dagîrkirna Efrînê ji hêla dewleta tirkî ya dagîrker ve, berê xwe daye kantona Şehba.
Navên birîndaran jî wiha ne: Mihemed Sekran, Elye Heyder Hebeş, Xalid Mihemed El-Elye, Sadiq Mihemed Hebeş û Mihemed Reşîd.
2`yê Çileya 2019`an de jî artêşa tirkî ya dagîrker û çeteyên wê navçeya Til Rifet topbaran kiribûn. Di encamê de 10 sîvîl şehîd bûbûn ku piraniya wan zarok bûn û 12 kes jî birîndar bûbûn.

## Hêzên Ewlekariya Hundir li ser êrişa hewayî ya li Kobanê daxuyanî da

Fermandariya Giştî ya Hêzên Ewlekariya Hundir ya bakur û rojhilatê Sûriyê, diyar kir ku balafira bêpîlot ya artêşa tirkî bi armanca têkbirina destkeftiyên Rêveberiya Xweser û ewleyiya herêmê, li başûrê Kobanê maleke sîvîlan bombebaran kir. Fermandariyê herwiha bang li Koalisyona Navneteweyî kir ku erkê xwe pêk bîne.

Fermandariya Giştî ya Hêzên Ewlekariya Hundir ya bakur û rojhilatê Sûriyê, têkildarî êrişa hawayî ya dewleta tirkî ya ser gundekî başûrê Kobanê ku di encamê de sîvîlek birîndar bû daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Daxuyanî wiha ye: “ Îro (22.01.2021) balafireke bêpîlot ya artêşa tirkî ya dagîrker li gundê Memîtê yê li başûrê Kobanê li malekê da. Di encamê de gundiyek birîndar bû. Em soz didin ku tevî astengiyan emê xebata xwe ya parastina herêmên xwe, parastina sîvîlan û ewleyî û aramiyê bidomînin. Dibare em bang li Koalisyona Navneteweyî dikin ku li hemberî êrişên domdar yên dewleta tirkî erkê pêk bîne.”

## Li Qamişlo careke din alozî derket.



Li gorî agahiyan, li devera Hîzama başûr ya bajarê Qamişlo di navbera Hêzên Ewlekariya Hundir û endamên “Dîfa Wetenî” ya girêdayî hêzên hikumeta Şamê de alozî derket.

Êvara Şemiyê li devera Hîzama başûr ya bajarê Qamişlo di navbera Hêzên Ewlekariya Hundir û endamên “Dîfa Wetenî” ya girêdayî hêzên hikumeta Şamê de alozî derket. Ev alozî piştî porvakasyonên endamên “Dîfa Wetenî” derket. Beriya niha jî “Dîfa Wetenî” li bajarê Qamişlo alozî derxistbû. “Dîfa Wetenî” êrişî sîvîlan û bendên kontorê yên Hêzên Ewlekariya Hundir kiribû.

## Hêza Ewlekariya Hundir nasnameya şehîdekî eşkere kir

Hêzên Ewlekariya Hundir nasnameyeke endamê xwe yê li bajarokê El-Kerame şehîd bûyî, ra gihand.

Hêza Ewlekariya Hundir ya bakur û rojhilatê Sûriyê bi daxuyaniyekê eşkere kir ku endamê wan Xalid El-Kerad roja Pênşemê li bajarokê El-Kerame yê rojhilatê Reqa şehîd bûye.
Di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku dema endamê wan li ser erkê xwe, bûye hedefa terorîstan di encamê de şehîd bû.ye
Li gorî daxuyaniyê nasnameya şehîd wiha ye: Nav û paşnav: Xalid El-Kerad. Navê bav: Hesen. Navê dayîkê: Qetine. Cih û dîroka



tevlêbûnê: El-Kerame, 05.09.2017. Cih û dîroka şehadetê: El-Kerame, 21.01.2021

## Şêniyên Reqa cenazeyê şehîd Xalid El-Kerad spartin axê

Bi sedan şêniyên Reqayê cenazeyê endamê Hêza Ewlekariya Hundir Xalid El-Hesen El-Kerad li goristana şehîd Sêvdar ya li bajarokê Cidêdat yê rojhilatê Reqa spartin axê.



Di merasim ali goristanê de ji rêveberên Hêza Ewlekariya Hundir ya Reqa Ebdulmutî Mihemed li ser rola şehîdan ya di pêkanîna aramiya li herêmê de axivî û got; destê xiyanetê yê xwe gihandî hevriyê me wê eşkere bibe û hesab jê were xwestin.
Serokê Meclisa herêma El-Keramê Îbrahîm El-Ebas jî got; armanca êrişa endamên Ewlekariya Hundir û endamên Meclisên Sîvîl ew e ku di nava civakê de tirsê çêkin. Lê wê ev êriş îradeya gelên herêmê xurttir bike.
Piştî axaftinan cenazeyê şehîd spartin axê.
Xalid El-Hesen li bajarokê El-Keramê yê rojhilatê bajarê Reqa ji hêla şaneyên çeteyan ve hatibû şehîdxistin.

## Lloyd Austin bû Wezîrê Parastinê yê Emerîka



Destnîşankirina generalê malnişîn Lloyd Austin ji bo wezareta parastinê, li Senatoya Emerîka hat pejirandin. Austin dibe amerîkiyê 2. yê afîrkî ku ji aliyê Joe Biden ve tê hilbijartin.

Austin yê 67 salî digel ku pêdiviya wî bi veqetaneke taybet ji Kongresê jî hebû, ji ber ku di vê dawiyê de teqawît bû û ji bo wezîfeyeke têkildarî sîvîlan hat diyarkirin, piştgiriyeke berfireh ji Demokrat û Komarparêzan girt.
Austin Sêşema borî ango piştî beşdariya leşkeran bi cilên sîvîlan di êrişa 6’ê Çile de ya li dijî Capitol, soz dabû ku li dijî tundrewên di artêşa Emerîka de şer bike.
Austin li pêşiya Komîteya Hêzên Çekdar ya Sentoyê wiha got: “Çalakiyên di demên dawî de di nava hêzên me de bûne, ji nijadperestî û tundrewiyê tên. Ev qet nayê qebûlkirin. Heta karibim ezê kar bikim ku hêzên xwe ji nijadperast û tundrawan xilas bikim.”




# Li Şehba pêşangeheke hunerî

Komîna Sînemayê ya herêma Efrînê bi hevkariya MSD’ê pêşangeheke wênesazî û peykersaziyê li hola Lîstokan ya kampa Serdemê vekir.



Bi pêmana salvegera 3. ya êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser kantona Efrînê, Komîna Sînamayê ya herêma Efrînê bi hevkariya MSD’ê pêşangeheke hunerî li hola Lîstokan ya kampa Serdemê ya kantona Şehba vekir. 44 şêwekar û peykersaz yên ji Efrînê beşdarî pêşangehê bûn. Amakedariya vê pêşangehê 4 mehan dewam kir. Pêşangeh bi durişma “Em tên ey Efrîn, Bi ruhê berxwedanê emê dagîrkeriyê têk bibin” hat lidarxisitn. Tê de 102 tablo û 10 berhemên peykesersaziyê hatin pêşandan, ku balê dikişînin ser komkujiyên dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê yên li dijî sîvîlan û zehmetiyên koçberên Efrînê yên li kampan.
Nûnerên deste û saziyên Rêveberiya Xweser, partî û saziyên siyasî, Kongreya Star û Meclisa Malbatên Şehîdan di vekirina pêşangehê de amade bûn.
Merasima vekirinê bi deqeyeke rêzgirtin dest pê kir. Piştî ji rêveberên MSD’ê Îlham Umer axivî, vekirina pêşangehê pîroz kir û berxwedana şêniyên Efrînê silav kir.
Hevserokê Komîna Wênesaziyê Erdelan Îbrahîm jî diyar kir ku li hemberî zehemtiyan sekinîn û bi îradeya xwe projeya xwe ya vekirina pêşangehê di nava rewşên koçberiyê de temam kirin. Îbrahîm got; bi vê îradeyê wê li hemberê dagîrkeran bisekinin û Efrînê rizgar bikin.
Pişt re deriyê pêşangehê ji aliyê malbatên şehîdan ve hat vekirin. Pêşangeh du rojan vekirî ma.

## Tevî imkanên kêm serkeftineke mezin



**Jiyan BOZO/Hesekê**

Mirov bi heskirinê digihe armanca xwe. Tevî zor û zehmetiyan ciwanên Kurd ji tinebûnê hebûnê diafrînin. Xwedîderketina li xeyalên zarokatiyê û israra bicîanîna wan, kesayeteke bihêz, civakeke dewlemed û nûjen digihîne.

**“EZ JI XWEZAYÊ PIR HES DIKIM”**

Ciwanê bi navê Hisên Ehmet Keya yê ji bajarê Hesekê li ser heskirinên xwe wiha axivî: “Ez 23 salî me. Xwendekarê Fekûlteya Endezyariya Çandinyê me. Ez ji xwezayê pir hes dikim. Ji 12 salî ve xweza û hebûnên di xwazayê de bala min dikşînin. Di wî temenê piçûk de min nedihişt nûçayeke rewşa hewayê di ser min re derbas bibe. Piştî mezin bûm heskirina min pirtir bû. Piştî qedandina refa 12an min berê xwe da Fakûlteya Endzyariya Çandiniyê. Çimkî ya herî zêde nêzî heskirinên min, ew bû. Sala 2017an min li ser facesbokê bi navê “Li Herêma Cizîra Sûrî Rewşa Hewayê” malperek vekir. Min bixwe di hêla Klîmatolojî û Meteorolojî, şopandina radarên hewayî û tevgera ewran de xwe pêş xist. Herwiha li cem min cîhazê pîvana baran û germê yê elektronîk heye. Ez formatên bernemeyên hewayê yên cîhanî dişopînim û bi baldariyeke mezin nerînên xwe didim.”

**“MEBESTA MIN JI VÎ KARÎ XIZMETA GEL E”**

Hisên Ehmet Keya nirxandina xwe bi van gotinan domand: “Mebesta min ji vî karî xizmeta gelê me yê li bakur û rojhilatê Sûriyê ye. Çimkî ji ber guherîna rewşa hewayê ya li seranserê cîhanê, di salên dawiyê de gelek bûyerên xwezayî yên biêş çêbûn. Ji bo wê min jî xwest gelê xwe bi imkanên xwe yên kêm jî agahdar bikim. Di malpera min de ji bajarên herêma Cizîrê çend nûçegihan hene. Em bi hev re kar dikin. Agahiyan kom dikin, wêne û dîmenan ji herêmên xwe ji min re rêdikin. Ji bo ku rewşa hewayê ya seranserê bakur û rojhilatê Sûriyê dişopînim, min navê malpera xwe guhert, kir “Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rewşa Hewayê”. Min bixwe dest bi vê gavê kir û ezê heta dawiyê bidomînim. Ezê xwe pêş bixim da paşrojê bikarim faydeyeke mezin bidim gelê xwe.”
Hisên Ehmet Keya axaftina wiha qedand: “Daxwaziya min ji Rêveberiya Xweser heye ku ji bo rewşa hewayê jî wezaretek û bi wezaretê ve girêdayî navendeke ku bikare 24 saetan rewşa hewayê bişopîne veke. Herwiha di zanîngehê de jî Fekûlteya Klîmatolojî û Meteorolojiyê veke.”

## Pêngava 2. ya pêşbirka wêneyan li Qamişlo hat lidarxistin

**Darîn SILÊ/Qamişlo**



Ji bo gihandina nifşekî nû, Desteya Ciwanan û Werzişê ya herêma Cizîrê 25ê vê mehê pêngava duduyan ya pêşbirka xêzkirina wêneyan, li bajarê Qamişlo saet 11an li yekîtiya werzişê li dar xist. Temenê pêşbirkvanên tevlî bûyîn ji 13 heta 35an e.
Pêşbirk li ser asta sê bajaran e. (Hesekê, Qamişlo, Amûdê) Pêngava yekê 23yê mehê li bajarê Hesekê çêbû. 28ê mehê jî li Amûdê diqede.
Derbarê mijarê de endama Desteya Ciwanan û Werzişê Meyada El Hisên wiha axivî: “Me ev pêngav li Ofîsa MSDê ya bajarê Hesekê da destpêkirin. Niha jî li Yekîtiya Werzişê ya Qamişlo dewam dike. Pişt re wê li Navenda Çand û Hunerê ya Amûdê bê lidarxistin û li wir bi dawê bibe. Di dawiyê de emê ji her bajarî sê kesên serkeftî hilbijêrin. Pişt re emê di navbera wan neh kesan de pêşbirkekê çêkin û ji wan jî wê sê kes werin hilbijartin. Di demên pêş de wê li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê pêngav dewam bike. Weke din ji bo dema pêş projeyên me yên nû hene.”
Meyade El Hisên axaftina xwe wiha qedand: “Armanca me ji vê pêngavê ew e ku em ciwanên xwe nêzî tiştên baş bikin û ji xirabiyê dûr bixin. Em bi vê gavê kêfxweş in, çimkî em ciwanên xwe fêrî zanebûnê dikin.”





## “Çanda me nasnameya me ye”

**Darîn SILÊ/Qamişlo**

Li bakur û rojhiltê Sûriyê tevî zor û zehmetiyan ciwan li çanda xwe xwedî derdikevin. Li navenda çand û hunerê ya Mihemed Şêxo ya li bejarê Qamişlo, ciwan bi kelecaneke mezin xwe fêrî huner dikin û dixwazin li hemberî tîrên bişaftin û asîmîlasyonê hunera xwe bikin mertal.

Têkîldarî mijarê hunermend Zekeriya Hesen li ser saz û awazên mûzîkê wiha axivî: “Ez 30 salî me. Ji bajarê Efrînê me. Piştî êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser bajarê me, em neçarî koçberiyê bûn. Niha li Qamişlo bi cih bûme. Ez mûzîkvanê beşa kemanê me. Min peymangeha mûzîkê xwendiyê. Xwesteka min xwendina beşa mûzîkê bû. Li pêymangehê gelek beşên mûzîkê hebûn, lê min ji kemanê hes dikir. Li malê birayê min her tim li tembûrê dixist. Ji ber wê min mereqa hunerê kir. Ez ji hunerê pir hes dikim. Li çand û hunerê carna tevlî şanoyê jî dibim. Berî dagîrkirina Efrînê, li gundê Cindirêsê min du salan perwerde da xwendekarên peymangehê. Ji Bilî wê min karê cuda jî dikir.”
Zekeriya Hesen axaftina xwe wiha domand: “Dema em hatin Qamişlo min berê xwe da navenda çand û hunerê. Niha li vir perwerdeyê didim. Nêzî 15 şagirtên min hene. Hin ji wan zarok, hin jî ciwan in. Ji ber zehmetiya kemanê şagirtan yek bi yek perwerde dikim. Şagirt rojê du saetan fêrî medrecmûsîqî dibin. Pişt re fêrî xwendina silemmûsîqî dibin. Piştî wê pirtûka bi navê sûzûkî dixwînin. Di pirtûkê de fêrî temarînên kemanê dibin. Piştî salekê dibin mûzîkvanên baş.”



**“XWESTEKA MIN VEGERA BAJARÊ MIN E”**

Zekeriya Hesen axaftina xwe wiha qedand: “Ez serkeftinê ji şagirtan re dixwazin, bi hêvê me di paşrojê de bibin hunermendin mezin û li çanda xwe xwedî derkevin. Çimkî çanda me nasnameya me ye. Herî dawî xwesteka min vegera li bajarê min e.”

# Emeliyên li Nexweşxaneya Dil û Çavan serketî bûn

Nexweşxaneya Dil û Çavan emeliya 2. ji nexweşekî re çêkir. Bijîşkê emelî çêkirî da xuyakirin ku her du nexweş bi encamên baş ji emeliyê derketine.



Piştî amadekariyên zêdeyî salekê ji bo çêkirina emeliya dil, li Nexweşxaneya Dil û Çavan ya li bajarê Qamişlo, 20`ê mehê emeliya yekê ya dil ji nexweşê bi navê Mihemed Berzencî (60) re hat çêkirin.
Di heman dîrokê de nexweşekî bi navê Ehmed El-Hemed (54) ji Reqayê anîn nexweşxaneyê. Rêveberiya nexweşxaneyê derengê şevê biryar da ku emeliyê jê re çêkin.
Têkildarî mijarê Bijîşkê pisporê emileya dil Selam Mihemed Hesen wiha got: "Rewşa her du nexweşan baş e. Digel ku nexweşê din ji sedî 99 rayên dilê wî girtî bûn, dîsa jî ew xeter derbas kir."
Selam Hesen diyar kir ku nêzî 6 nexweşên din jî hene navê xwe tomar kirine wê di rojên bê de emelî ji wan re bê çêkirin.
Selam Hesen herwiha da zanîn ku 5 bijîşk derbasî emeliyê bûne, 2 ji wan pisporên emiliya dil bûn.

## Kampa Newroz: Pêwîstiya xwendekaran bi alîkariyê heye

**Dilîn EHMED/Qamişlo**

Êrişên dewleta tirkî yên 9`ê Cotmeha 2019an yên ser bajarê Serê Kaniyê û Girê Spî, bûn sedema koçberiya sîvîlan û dûrxistina zarokan ji dibistanên wan.
Dewleta tirkî, bi hezaran malbatên Serê Kaniyê û Girê Spî, neçar kirin ku mal û milkên xwe li bişt xwe bihêlin û wek noka li kevir bikeve her kes biçe deverekê. Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê, koçberên van bajaran li Kampa Newroz ya li bajarê Dêrikê bi cî kirin. Herwiha ji bo perwerdeya zarokan jî dibistanek ava kir. Heyva Sor a Kurdî jî ji bo tenduristiyê li wir dimîne. Ji bo aramiya kampê jî bi şev û roj asayiş li ser kar e.





**"DIVÊ ALÎKARÎ BI XWENDEKARAN RE WERE KIRIN"**

Ji rêveberiya dibistana Kampa Newroz Noşîn Umer diya kir ku heta ji wan tê bi derfetên heyîn, pêdiviyên xwendekaran pêk tînin û wiha got: "Bi giştî rewşa dibistana kampê baş e. Meha Îlonê me dest bi xebata xwe kir. Ji ber ku zarok ji dibistanên xwe dûr ketine, bandoreke mezin li derûniya wan bûye. Ji ber ku her roj koçberên nû tên kampê, rojbiroj jimara xwendekaran zêde dibe. Destpêka vekirina dibistanê jimara wan 50 bû, lê niha 179 in."
Noşîn li ser zehmetiyên derdikevin wiha axivî: "Em di dayîna minhacê de kêm mane, lewra hin ji xwendekaran nû îsal tevlî perwerdeyê dibin. Em jî neçar dibin ku ji tîpan dest bi waneyan bikin. Ji bo derûniya wan jî, hefteyê carekê em semîneran didin. Tevî rewşa zehmetiyan, xwesteka wan ya fêrbûnê pir e. Em jî bi derfetên heyîn, bi wan re dibin alîkar."
Noşîn Umer axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Di dawiyê de vê dibêjim; divê rêxistinên mirovî erkê xwe pêk bînin û ji bo pêdiviyên dibistanê alîkariya xwendekaran bikin. Em mamoste jî heta ji me tê em nahêlin zarok ji perwerdeyê qut bibin û çi ji me were xwestin em amade ne."

**"MIN BÎRIYA HEVAL Û DIBISTANA XWE KIRIYE"**

Xwendekara refa yekê ya bi navê Jiyan jî, bi hestê xwe yê mîna yê firîşteyan wiha axivî: "Ez bi mamosteyên xwe kêfxweş im û ji dibistana xwe jî pir hes dikim. Lê min pir bîriya bajarê xwe dibistan û hevalên xwe kiriye. Êrişa ser bajarê me, bû sedema qutbûna destê me ji dost û hevalan. Min pir dixwest hevalên xwe li vir bibînim, lê mixabin heta niha min ti kes nedîtiye. Ez hêvî dikim ku rewşa wan baş be û em di demeke nêz de bi hev re vegerin bajarê xwe."

## Pirsgirêka xeta petrolê ya li Tirbespiyê hat çareserkirin


Werşeyên xebatê yên xetên petrolê pirsgirêka di boriya petrolê ya li herêma Cerih ya girêdayî navçeya Tirbespiyê de, bilez çareser kirin.
Pirsgirêka di xeta petrolê de ku di çemê Cerih re derbas dibe, bû sedem ku petrol biherike ser çem. Şêniyên gundên derdora çem, berpirs agahdar kirin. Rêveberiya Daristan û Parêzgehan û Rêveberiya Jêderên Avê yên herêma Cizîrê, bi alîkariya werşeyên Rimêlanê bilez pirsgirêk çareser kirin.
Rêveberiyê stasyona Seîde ya petrolê li navçeya Tirbespiyê Hesen Enter got; ev xet nayê bikaranîn. Ji ber ku di binê çem re derbas dibe, zingarî bû û qul lê çêbû.



Hesen Enter da zanîn ku werşeyên wan piştî agahdarkirinê yekser dest bi kar kirine û pirsgirêk çareser bûye. Werşeyan tor restore kir da ku careke din petrol neherike çem.
Hesen Enter piştrast kir ku werşeyên wan çem heta dawiya rêça wê paqij kirine û berî ku petrol bigihe gundê El Reş, pirsgirêk çareser kirine.
Çemê Cerih di 7 gundên Tirbespiyê re derbas dibe û avê dide bendava Mizgeft ya girêdayî navçeyê.

## YPG bi malbatên şehîdan yên Qamişloyê re civiya

Civîn li hola Rewabî ya li aliyê rojavayê bajarê Qamişlo hat lidarxistin. Hol bi alên YPG, YPJ, QSDê, Meclisa Malbatên Şehîdan û wêneyên rêber Abdullah Ocalan hatibû xemilandin.
Civînê bi rêzgirtinê dest pê kir, dûv re Berdevkê Fermî yê YPG`ê Nûrî Mehmûd axivî û got: "Ji bo min cihê serbilindayiyê ye ku ez li vir û li pêşberî malbatên şehîdan sekinîme. Şehîdan ji bo parastina zarokên welatê xwe li ser bingehê demokratiyê û parastina mirovayiyê canê xwe feda kir."
Nûrî Mehmûd da zanîn ku malbatên şehîdan pêşengên wan in û axaftina xwe wiha domand: "Heke ne ji fikir û helwesta şehîdan û erkê parastina xakê ku girtin ser xwe bûya wê herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê herêmên DAIŞ`iyan buna. Li bakur û rojhilatê Sûriyê li derdora 11 hezar şehîd hene û li dijî DAIŞ û sîstemên şofînîst yên tundrew ku artêşa tirkî di nav de ye, efsaneyên dîrokî nivîsandine."
Berdevkê Fermî YPG`ê Nûrî Mehmûd got; divê her kes erkê xwe pêk bîne, destkeftiyên ku bi saya şehîdan hatine bidestxistin, biparêzin û bi vî awayî bikarin xwe bigihînin Sûriyeke demokratîk, destûreke demokratîk ku rêzê ji azadiyê, rûmet, çand û ola civakan re bigire.
Di dawiya civînê de Koma Botan ya



Desteya Çand û Hunerê ya herêma Cizîrê stiranên derbarê şehîdan de gotin û zarokekê ji Koma Kulîlkên Kurdistanê helbestek xwend.

## Washıngton-Ankara-Moskova



**Ahmet AKTAŞ**

Siyaseta Enqera, di navbêna siyaseta Rûsya û Emerîka de tengav bûyî. Weke wê gotina, "di navbêna dêrê û mizgeftê de ma ye"! Mirov li goreyî mijara heyî wisa jî bi guheze; "mizgefta di navbêna du dêran de maye".
Lê siyasetmedarên Enqerê, li xwe danaynin bêjin "em di navbêya du kinîsan de bênimêj man in", berovajî, dibêjin "em mirovin ewqas jîrin, em karin ji nakokiyên navbêna van dewletên mezin sûd bigrin". Xwe weke Ataturk jî nîşan dide, "wî çawa karibû ji nakokiyên navbêna sosyalizmê û emperyalizmê sûd bistaeda, ez jî dikarim bistînim"!
Enqereyê ji van nakokiyan hinek qezenc bi dest xist. Lê wisa diyar e ew ê nikaribe êdî ti tiştî qezenc bike. Ji ber ku nakokiyên navbêna Moskova û Washingtonê jî dijwartir dibin û ber bi qonaxa dawî diçin. Li Iraqê bi giranî Emerîka serdeste. Lê li Suriyeyê û bi taybetî li Rojava, êdî hêzên her du dewletan, li pir deveran yekser tên dijberî hev. Di vê qonaxê de Enqere naçar e ku hilwesta xwe aşkeretir bike; di navbêrê de nabe, ya li gel Moskova ya jî li gel Washingtonê ye?
Plana wan a li Bexdayê ne meşiya, berovajî, M.Kazimî, "fermana" H.Akar ne pejirandibû û 5 milyar dolarê "ruşweta" R.Erdogan soz dabûyê xwestibû. Îja dest bi şêwazê xwe yê kevn ê afirandina tirsî û şantajê kir. Ji rojnamevanan re dibêje, "hûnê binêrin, şevekê ji nişka ve dibe ku ez werim", her wiha gotinên "em ê êrîşî Şingalê û Dêrike bikin" û hwd.
Li goreyî tê xuyakirin, ji her alî ve tengav bûye. Ji bo temenê desthilatiya xwe hinekî dirêej bike, gelek şelpeze bûye. Hinek kes û koman dişîne Moskovayê, ji bo li gel Şamê jî pêkwere. Hikmet Fidanê MİT'ê û H.Akar, xistine ser rêya Bexda û Şamê û Hewlerê. Çavuşoglu şandiye Ewrupayê, hinek kesên din şandine DYE, ji bo cihê xwe bi rêveberiya Bidên pejirandin û hwd.
Ne li van dewletên mijara gotinê ne û ne jî li welatên Efriqayê jî hewdanên wan, têra serkeftina siyaseta wan a talanker û qirker dike. Hinek hêviya wan, piştî Libyayê, li bazarên Somali, Mali, Kongo, Sudan û hwd.hebû, lê diyar dibe ku hewldanên wan pûç derdikeve. Weke mînak, li nêzî Somali û nuha jî li Kendava Gineyê, geştiyên wan, raserî êrîşên korsanan hatine û derbeyên giran xwarine.
Êdî bombeyê Enqereyê di destê wê de di teqe. Erê hinek hewldanên xwe yên dawî jî dixwaze bide xebitandin. Vê valatiya ku hîn sayaseta nuh a DYE runeniştiye, weke derfet/fersend, hinekî ji xwe re bi karbîne. Rola Moskova jî di di van hewldanan de xurt e. Di vê çarçovê de li Qamişlo û Hesekê hinek provakasyon pêkhatin.
Gûmana xurt ew e ku siyaseta Enqereyê, bi ser nakeve û di nava siyaseta Moskova û Washingtonê de di fetise.



# Kongreya Star: Kuştina Seide û Hindê êrişa ser îradeya jinan e

Koordînasyona Kongreya Star bi daxuyaniyekê kuştina hevseroka meclisa bajarokê Til El-Şayir yê girêdayî navçeya Deşîşa ya başûrê kantona Hesekê Seide Feysal El-Hermas û cîgira hevserokatiya meclisê Hind Letîf El-Xidêr şermezar kir.




Koordînasyonê diyar kir ku ev sûc di radeya yekê de îradeya jinan dike hedef ku bûne hêzeke fikrî, siyasî, civakî, leşkerî û dîplomatîk û gihîştine asteke ku dikare barê rêveberiyê û şoreşê rake û wiha dewam kir: "Herwiha jin beşdarî tevayiya qadên xebatê bûn, hebûna xwe isbat kirin, roleke çalak di civakê de lîstin û li dijî zihniyeta desthilatdar û zihniyeta baviksalar tê koşiyan. Lêbelê tevî vê berxwedan û têkoşînê jî ku li seranserê cîhanê deng veda, hê jin rastî sûcên kuştin, revandin, tundî û hr cureyên êrişan tên."
Di dewama daxuyaniyê de hat gotin ku armanca vî sûcî têkbirina ewleyî û îstiqrarê ye û belavkirina tirsê di nava gelên bakur û rojhilatê Sûriyê de ye, da ku jiyaneke birûmet ku tê de demokrasî û biratî heye, çênebe û wiha hat gotin: "Em Koordînasyona Kongreya Star sersaxiyê ji malbatên her du şehîdan re dixwazin. Em bang li tevayiya xebatkaran dikin ku li hemberî planên qirê yên îrade û




azadiya jinan dikin hedef, hişyar bin."
Di daxuyaniyê de topbarana dewleta tirkî ya dagîrker ya li ser herêmên Şehba û navçeya Til Rifetê hat şermezarkirin ku di encamê de jin û zarok şehîd bûbûn.
Di dawiya daxuyaniyê de hat diyarkirin ku li hemberî faşîzma tirkî û sûcên hikumeta AKP`ê wê berxwedan û têkoşîna ji bo azadî û demokrasiyê bidomînin.
Şeva Înê hevseroka meclisa bajarokê Til El-Şayir yê girêdayî navçeya Deşîşa ya başûrê kantona Hesekê Sada Feysel El-Hermas û cîgira wê Hind Letîf El-Xidêr ji aliyê kesên nenas ve hatin revandin û pişt re hatin kuştin.

## Bêrîvan Xalid: Jinan mohreke diyarker li Rêveberiya Xweser xist

Bêrîvan Xalid got; rola jinan di Rêveberiya Xweser de diyarker û şênber e. Jinên ku di Rêveberiya Xweser de cih digirin, jinan teşwîq dikin ku rola xwe di civakê de pêk bînin. Bêrîvan Xalid diyar kir ku têkoşîna parastina destkeftiyên jinan û xilasiya ji zihniyeta desthilatdar dewam dike.
Hevseroka Meclisa Rêveber ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê Bêrîvan Xalid di hevpeyvînekê de xebata du salan ya jinan di Rêveberiya Xweser de nirxand. Bêrîvan Xalid bal kişand ser rola jinan ya di Rêveberiya Xweser de û zehmetiyên dîtîn. Herwiha diyar kir ku jinan bi beşdariya xwe ya çalak di navenda biryarê de mohra xwe li Rêveberiya Xweser xist.

**HEVPEYVÎN WIHA YE:**

**Jinan çawa xwe di nava Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê de bi rêxistin kir û hûn asta jinan di 2 salên avabûna rêveberiyê de çawa dinirxînin?**
Jinan di nava rêveberiyên xweser û yên sîvîl de di qada siyasî, leşkerî û aborî de roleke sereke lîst û di aliyê rêveberiyê de roleke pêşeng girtin.
Ji destpêka ragihandina Rêveberiya Xweser ve ji herêma Cizîrê, Efrînê, Firatê û heta Rêveberiyên Sîvîl yên Tebqa, Minbic, Reqa û Dêrezorê, jinan xwe di nava rêveberiyê de bi rêxistin kir.
Ev rêxitin li ser asta hevserokatiyê di tevayiya deste, nivîsgeh û komîteyan de û li ser asta nûnertiyê di binê navê Koordînasyona Jinan ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê de, pêk hat.

**Beşdariya jinan di Rêveberiya Xweser de çi da guhertin û çi lê zêde kir?**
Bi giştî jinan mohreke diyarker li



rêveberiyê xist, di aliyê rêveberî û rêxistinî de beşdariyeke jinan ya erênî û çalak heye. Di beşdariya wê di hevserokatiyê de jî astengî û zehmetî li pêşiya wê hene. Lewre di civaka me de jin ji ber zihniyeta baviksalarî êrî dikişînin, ku rola jinan di asta hevserokatiyê, nûnertiyê û li navendên biryarê û berpirsiriyarê de qebûl nakin.
Helbet, jin parçeyeke civakê ye û beşeke mezin ji civakê temsîl dike. Jinan gelek zehmetî kişandin. Di sala 2020`î de weke beşên din yên civakê, jinan jî zehemtî dîtin, lê belê azarên wan zêdetir bûn. Tevî astengî, zehemtî û rexneyan jî, jin xwedî roleke girîng bûn û mohra xwe li tevayiya qadên jiyanê xistin.

**Jin bi beşdariya xwe di Rêveberiya Xweser de çawa li hemberî zihniyeta baviksalarî têdikoşin?**
Sîstemên desthilatdar xwedî têgeh û feraseteke diyar bûn. Wan serweriya mêr li ser jinê di civakê de temsîl dikir. Li gorî wî mêr çavdêr, rêveber û serok bûn. Lê belê Rêveberiya Xweser bi pêkanîna sîstema hevserokatiyê li deste, nivîsgeh û meclisan (Meclisa Rêveber, Meclisa Qanûnsaz) karîbû vê zihniyetê derbas bike.

**Jin çawa dikarin şerêndesthilatê rawestînin û nehêlin ku rêveberî veguhere desthilatdariyê?**
Di civînên rêxistinî, dewreyên perewerdeyê, diyalog û semîneran de perspektîfên ji bo xilasbûna ji şerên desthilatê ku sîstemên desthilatdar disepînin, dewam dikin. Da jin rola xwe wek rêveber ne wek desthildar bilîzin, berevajî ku sîstemên desthilatdar hewl didin di zihniyeta civakê de bidin rûniştandin.

**Rêveberiya Xweser wekî aliyekî berpirsyar, çawa piştgiriyê dide rêxitinên jinan yên bakur û rojhilatê Sûriyê? Gelo piştgiriyeke taybet ji bo bidawîkirina tundiyê heye?**
Di Rêveberiyên Xweser û Sîvîl yên bakur û rojhilatê Sûriyê de, deste û komîteyên jinan hene. Herwiha rêxistinên jinan û saziyên civaka sîvîl li herêmê hene, ku bi awayekî domdar bi wan deste û komîteyan re koordîne dike. Hemleyên zanakirinê yên hevbeş jî hene. Piştgiriya madî û manewî ji hemû rêxistinên jinan re tê dayîn.

**Destkeftiyên jinan yên sereke di 2020`î de çi bûn?**
Ji dema avakirina Rêveberiya Xweser ve, jinan li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê gelek destkeftî bi dest xistin. Ji qanûna jinan, erêkirina qanûnê û pêkanîna wê li herêmên bigire, heta sîstema hevserokatiyê û beşdarbûna di tevayiya nivîsgeh û desteyên Rêveberiya Xweser de û rola wê ya pêşeng di şoreşa nakur û rojhilatê Sûriyê de.
Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê gelek destkeftî û projeyên jinan hene. Di sala 2020`î de bi taybetî li pêşiya jinan gelek astengî hebûn, ji wan astengiyên aborî, siyasî û civakî bûn, hin astengiyên tenduristî jî hebûn wekî vîrûsa Koronayê. Astengiya herî dijwar jî êrişên dewleta tirkî ya dagirker li ser nakur û rojhilatê Sûriyê bû ku bandor li xebata Rêveberiya Xweser bi giştî û li xebata jinan bi taybetî kir.

## Bi pêşengiya jinan wê sala 2021ê bibe sala serkeftinê

**Jiyan BOZO/ Qamişlo**

7 salên têr û tijî derbas bûn. Tevî zor û zehmetiyan Rêveberiya Xweser mora xwe li dîrokê xist. Jinên bakur û rojhilatê Sûriyê jî, ji bo parastina destkeftiyan plansaziyek mezin û girîng dane pêşiya xwe.

**"JINAN DI TEVAYIYA SAZÎ Û DESTEYAN DE KAR Û XEBATKE SERKEFTÎ KIR"**

Derbarê mijarê de cîgira Desteya Jinan ya bakur û rojhilatê Sûrî Rûken Mele Îbrahîm wiha axivî: "Em salvegera avakirina Rêveberiya Xweser li tevayiya gelên herêmê pîroz dikin. Di avakirina rêveberiyê de jin xwedîroleke sereke bûn û pêşengiya wê kirin. Di dîroka Sûrî de cara yekê desteya jinê di nava rêveberiyê de hat avakirin. Vê rêveberiyê gelek zor û zehmetî dîtin. Lê bi israr û keda xwe bi ser ket. Piştî avakirina Rêveberiya Xweser bi salekê, projeya hevserokatiyê hat danîn. Jinan di tevayiya desteyan de li kêleka mêr ciyê xwe girt. Ev 7 sal in rêveberî karê xwe serkeftî dimeşîne. Jin jî bi awayekî çalak tevlî dibin.

**"WÊ SALA 2021Ê JI JINAN RE SALEKE GIRÎNG BE"**



Rûken Mele Îbrahîm axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Civîna Koordînasyona Jinan ya bakur û rojhilatê Sûrî (17,01.2021) li Reqa li dar ket. Di civînê de gelek biryar hatin dayîn. Yek ji biryarên girîng zagona jinê bû. Ji bo wê, karê me yê sereke yê sala 2021ê wê erêkirina vê zagonê ji bo seranserê bakur û rojhilatê Sûriyê be. Ev zagon heta niha ji bo herêma Cizîrê tenê bû. Ji bo em xwe bigihînin jinan tevan projeyên me yên dayîna semîneran hene. Xala bingehî ya civîna me -hevalên mêr yên di rêveberiyê jî di navê de-, perwerdekirina tevyiya mêran bû. Xaleke din ya civînê pêkanîna projeyên jinan û xwedîderketina li jinên di girtîgehan de û perwerdekirina wan bû. Herwiha sazkirina rêziknameya Koordînasyona jinan jî yek ji biryaran bû. Civîna me bi 18 xalên bingehî bi dawî bû. Ji ber wê, wê sala 2021ê ji jinan re saleke girîng be."



# Derar: Astana xeta şoreşê guhert, komîteya destûrî jî temenê hikumeta Şamê dirêj dike

Hevserokê MSD'ê got; encama civînên Astana xeta şoreşa Sûriyê guhert û diyar kir ku komîteya destûrî binketî ye û temenê hikumeta Şamê dirêj dike.

Hevserokê Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) Riyad Derar têkildarî derbasbûna 4 salan di ser destpêkirina civînên Astana re (yên di navbera Rûsya, dewleta tirkî û Îranê de) wiha axivî: "Em bi vexwendina Astana û kongreya Soçî ne rihet bûn. Lewre me tê de hewldana girêdana opoziyona Sûriyê bi ajandeyên rejimê ve dît. Herwiha hewldana komkirina pirsgirêka Sûriyê hat kirin. Ev heta niha tê meşandin."

Derar da zanîn ku ku operasyonên sivikkirina şer û parçekirina Sûriyê bi Astana û tesfiyekirina opozisyonên çekdar pêk hat û wiha got: "Çeka ketî destê opozisyonê bû aktora guhertina wêneya rasteqî ya opozisyona ku bi demê re veguherandin wêneyeke terorîst û hişt ku cehwerê opozisyonê biheje. Ev encama lewaziya têgihiştina opozisyonerên Sûrî û nesazbûna xebata opozisyonê ye."




### "MSD CUDATIR E"

Têkildarî siyaseta MSD`ê ya li bakur û rojhilatê Sûriyê, Derar diyar kir ku di nava sîstema Meclisa Sûriya Demokratîk de mekanîzmeyeke ji ya opozisyonê cudatir hilbijartine. Ji ber wê di qada navneteweyî de weke itirafekê pê çêbû, lê dîsa jî ne li gorî ku tê xwestin û ne li gorî asta geşedanan e.

### "QSD LI DIJÎ DAIŞ`Ê SEKINÎ"

Riyad Derar eşkere kir ku QSD li dijî terora DAIŞ`ê û hevalbendên wê disekine û wiha domand: "Me bi hev re ji bo avakirina Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê kar kir. Bi vê me rûyê rastî yê Sûriya paşrojê û Sûriya nû diyar kir. Li ser vî esasî Astana her tim li dijî vê projeyê disekinî û digot; projeya parçekirinê ye."

Derar da xuyakirin ku aliyên Astana (Rûsya, Tirkiye û Îran) heta îro bi Amerîka re bi nakok in. Ji ber wê opozisyon li kêleka her sê aliyan sekinî û li gorî ferman û xebata wê tev geriya.

Hevserokê MSD`ê bal kişand ser binketina Astana û wiha domand: "Binkeftina Astana destpêkê encama guhartina xeta şoreşa Sûriyê ye, ya 2. jî dûrkirtina wê ji biryarên Cinêvê ye."

### "KOMÎTEYA DESTÛRÎ BERÊ Û NIHA JÎ BINKETÎ YE"

Hevserokê MSD`ê Riyad Derar axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Di pêvajoya rêgehên şoreşan de Sûriye bû derseke binketî û xetekê dide nîşankirin ku tişta tê xwestin ew e ku gel di binê hikumê dewlet, rejim û hikmekî diyarkirî de bimîne. Herwiha girêdayî ajandeyan be û dûrî siyaseta ku banga azadî rûmetê dike, bikeve."

*AZAD SEFO/ANHA*

# Efrîn ji dagîrkeran re namîne

**Leylan RESO/Qamişlo**

Sê sal di ser dagîrkirina Efrînê re derbas dibin. Ji dagîrkirinê vir ve ji aliyê dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê ve, bi sedan kes hatin revandin, kuştin û destdirêjî li jinan hat kirin. Li bakur û rojhilatê Sûriyê bi pêmana salvegera sisiyan ya damezirandina bajarê Efrînê, bi durişma,"Dem dema parastina şoreşê ye," rêzeçalakî hatin lidarxistin.

### "EFRÎN BAJAREKÎ KURDISTANÊ YE"


Endama Nivîsgeha Têkiliyên Derve ya Zanîngeha Rojava Gulîstan Sîdo, li ser salvegera 3. ya dagîrkirina Efrîn wiha axivî: "Ev sê sal in Efrîn dagîr bûye. Gelê ku dixwaze vegere ser xaka rojane êşa koçberiyê dikişîne. Gelê Efrînê yê berxwedêr niha li deverên cuda koçber in. Li hemberî berxwedana 58 rojan û bi hezaran şehîd û birîndaran em bejina xwe ditewînin. Dagîrkirina Efrînê encama komployeke navneteweyî bû. Ji bo berjewendiyên hêzên serdest Efrîn hat firotin û dagîrkirin. Ev sê sal in dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê li Efrînê sûcên dijmirovî dikin. Qirkirineke arkeolojîk, aborî û çandî dikin. Efrîn bajarekî Kurdistanê ye, çandeke resen ya kurdî li wir heye. Ji ber wê êrişî vê çandê kirin. Herwiha êrişî tevayiya warên kevnar kirin."

Sîdo axaftina xwe wiha domand: "Di warê çandî de jî, zimanê dayîkê qedexe kirin û zimanê tirkî û erebî li herêmê kirin mecbûrî. Qirkirina herî mezin û kiryarên hovane bi jinên Efrînê tên kirin. Di gelek raporan û di rojnameyên emrîkî de qirkirin, kuştin, revandin û destdirêjiya li jinên Efrîn hatin belgekirin. Divê pêşiya vê rewşê bê girtin. Emê li ber xwe bidin heta ku deverên me yên dagîrkirî tev bên rizgarkirin û emê serkeftinê bi hevgirtina gelan pêk bînin."

### "EM SOZA TINEKIRINA DAGÎRKERIYÊ Û RIZGARKIRINA EFRÎNÊ DIDIN"

Hevseroka Desteya Hundir ya bakur û rojhilatê Sûryê Hêvî Mistefa jî ev nirxandin kir: "Berî 3 salan êriş û hovîtiyek pir mezin bi ser Efrînê de hat û cîhan bêdeng ma. Heta niha jî ev kiryar dewam dikin. Her roj talankirin, kuştin, revandin û destdirêjiya li jinan dibin. Digel hovîtiya tê kirin û





êşa dikişîne, ti hêz nikarin vîna gelê Efrînê û berxwedana wan bişkînin. Bi pêmana salvegera dagîrkeriyê li seranserê bakur û rojhilatê Sûriyê çalakî çêbûn. Ev berxwedan nîşan dide ku ti tişt nikare vîna gelê Efrînê bişkîne. Em jî soz didin ku vê dagîrkeriyê tine bikin û Efrînê rizgar bikin."

# Necmedîn Mele Umer: Li hemberî tecrîda giran, fikirê Ocalan ji gelê şoreşger re bûye çira



Necmedîn Mele Umer diyar kir ku vîna rêber Abdullah Ocalan bi tecrîda giran jî têk neçûye û got; tersê têkbirinê, vê vînê û bi xurtbûna tevgera Azadiyê aliyên kevneperest û nijadperset tên çewistandin.

Sekerterê Giştî yê Partiya Komûnîst ya Kurdistanê Necmedîn Mele Umer têkildarî tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan ji ajansa nûçeyan ANHA re axivî.

Necmedîn Mele Umer da zanîn ku tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan li cihekî cîhanê nîne û got; ji ber ku bandora fikir û felsefeya rêber Ocalan li ser tevayiya Kurdistanê heye û şoreşeke demokratîk ava kiriye, dewleta tirkî jê ditirse."

Mele Umer axaftina xwe wiha domand: "Dewleta tirkî difikire ku heta rêber Ocalan girtî be wê doza gelê Kurd aloz be. Lê nizanin ku bîrdoziya Ocalan ji gelê şoreşger û gelê Kurd re bûye dibistaneke weke çirayê."

Mele Umer got, ya tecrîdê dike ne dewleta tirkî tenê ye, hêzên hegamon û nijadperest yên ku gelan qir dikin jî hene.

Mele Umer da xuyakirin ku pirsgirêka li Rojhilata Navî bi tecrîda li ser rêber Ocalan ve girêdayî ye. Lewre Ocalan xwediyê raman û fikirên kûr û berfireh e.

Sekreterê Giştî yê Partiya Komûnîst ya Kurdistanê Necmedîn Mele Umer axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Eger ji fikirê rêber Ocalan natirsin, çima bernadin? Bi girtin û tecrîda li dijî rêber Ocalan, eşkere dibe ku dewletên hegamon ji fikir û felsefeya wî ditirsin. Ji ber wê bernadin.



## Berxikên Cejna Têkçûna Giran In

**Idrîs HENAN**

Hîsên berxwedanê nahêle ku mirov bi borîna rojan bihese. Tenê kêliyên bi êş cokên damaran vedikolin û cehra bendewariyan têde diherikînin. Êş ne wendahî û ne jî mirina bi rûmet e. Berovajî; eger wendahî û mirin di oxira hêviyên mezin de bin, zafera herî misoger e. Lê êşa ku em behsê dikin ew e; kêra li piştê ye! Hemû kêr jî dilê mirovan naêşînin. Lê dema kêrvan bira, xwişk û xizim be, wê çaxê bêhna ixanetê difore û mejiyê mirovan tevlî hev û din dike. Eceba di ser vê êşê re ti êşeke din a beloq heye mirov qalê bike?

Gelê me yê Efrînê li kampên penaberan li kantona Şehbayê fena mêşên hinguv helik û kewareyên berxwedanê ava dike. Ti caran guhên xwe ji vedenga çiyayan dûr nekiriye. Ne jî çavên xwe ji asoyê çiyayê Parse Xatûn û Lêlûnê birandiye. Dilê xwe li navenda Efrînê lê dide û semayan li ber hêviyên xwe digerîne. Bi dahol û zurneyan, bi kokên zeytûn, çinar û merxan, bi libên axa sor û gewir, bi kêlikên bav û kalan, bi bilindahiya çiyayê gewir û deşta cûmê, bi eshab û ewliyayên xwe, rojane sond dixwe û dilsoziya xwe dubare dike ku wê vegere. Ecîndeya rojê çibe bila bibe, di nav xêzikên wê de bondekî pe'in a vegerê heye. Mîna bîsmîlahan roja xwe bi selewatên vegerê dest pê dike. Di nivînên sar ên koçberiyê de jî, çav-vekirî xwe dirazîne. Xew nake lê ji wesitîna bendeweriyê re di nav xeyalên berxwedanê de xwe dirêj dike û libên darên zeytûnê yek bi yek dihesibîne. Dîsa jî tîna wî ya vegerê têr nabe. Ancax vegerek bi heybet a zafereke mezin be. Wisan plan dike. Çawa ku nexşeyek be xêzên çep û rast têde dikişîne. Hemû xêzên nexşeyê jî berê tîra wan navenda dil e. Carinan dengên kirêt ên koviyên dev bi xwîn di guhên wî re derbas dibin. Bi qasî ku zirîn bi ser ketiye, nema tê zanîn ka çi ajalekî xwînvexwar e?. Eceba dêw, keftar an dirindeyekî didan dirêj ê bê esil û nesil e?. Dibe ku mirovek xwedî nasnameya axê yê bê kok be? Dibe jî rewrewa seyekî di ber kerwanê hêviyên rastiyê re ê bi qoç be? Lê dîsa jî xem nake, ne ew û ne jî ewên dîtir, mûyek be jî, dikarin rûyê azweriyên dilxwaziya Efrîniyan biguherin.

Dikarin li ser her ekranekê li dijî vîna Efrîniyan weke nasnameya "Kurdekî" jî bifezlikin. Heya têr dibin, dikarin derew û bê bextiyan bikin, heya ji wan bê, dikarin çermên xwe biguherin, gengaze pelçim û giyayên mirdar ku di berkoz û axirên neyaran de hişîn hatine de li xwe bikin û hewl bidin bê bextî, bê sincî û xwefiroşiya xwe veşêrin. Lê ti carî nikarin paşiya xwe ya rût bisitirînin.

Piştî sê salan, sê êşan, sê mirinan û sê kêran, weke teyrên parçekirî yên pêxember Îbrahîm Xelîlan, parçeyên bedena kokên Efrînê zindî dibin. Çiqas laş hatibe hetikandin, qutkirin, tecawizkirin û şewitandin, hîna jî rehên jiyanê di bin axa gerim a bi bereket de xweş û zindî dibin. Zîl didin, hişîn dibin û bi ber dibin. Libên xwe fena guleyan di sîngê neyar, dagirker û xwefiroşan de diçikin. Êşa ji derbeya kêrvanê xedar diêşîne, lê kêrvan hayî ji xwe nîne ku stûyê wî li ber kêra celad û batronê wî ye. Dilopên xwîna reş a genî jê deherikin, lê hîna jî pê nehesiyaye ku dê bibe berxikê cejna têkçûna celad û neyarên dara zeytûnê.



# Şehîdên komkujiya Til Rifet hatin veşartin

## 'Armanca dagîrkeriyê kuştina gelan e'

Şêniyên Efrîn û Şehbayê bi merasimeke girseyî dayîka Nazliye Mihemed Mustefa li goristana Fafînê ya Şehîdan spartin axê. Her du zarokên Majêd Yasêr Sekran yê 5 salî û Ebdulmuhsên Sekran ê 12 salî jî li bajarê Til Rifet hatin veşartin.

Merasima ji bo dayîka Nazliye bi deqeyeke rêzgirtinê dest pê kir. Pişt re li ser navê Desteya Rêveber ya PYDê li Herêma Efrînê Hediye Yûsiv axivî. Yûsiv şehîdên doza azadiyê bîr anîn û sersaxî ji malbatên şehîdan re xwest û ev tişt anî ziman: " dagîrkerî ji ber daxwazên me yên azadî û demokrasiyê her roj êrişî me dike. Naxwaze gelên Sûriyê bi îradeya xwe bijî. Ji lew re berî Kurdan êrişî Ereb, Asûr û Kildanan dike". Hediye Yûsiv di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku wê heta dawiyê girêdayî doza şehîdan bin got; êrişên dijmin ranawestin. Dibe ku girantir jî bibin. Lê em jî di avakirina Sûriyeya demokratî, pirrengî û azad de bi israr in.

Li ser navê Meclisa Rêveber ya kantona Efrînê Mihemed Remedan jî wiha axivî: "Êrişên ser Şehba û yên tevahî bakur û rojhilatî Sûriyê hemwextî hev in. Mirov nikare cuda bigire dest. Di êrişa li ser Til Rifetê de, diyar e lihevkirina Şam û Enqere heye. Ji bo wê jî Rûsya qaşo gerantor e, lempeya kesk pê xistiye. Lê bila hemû alî jî baş zanibin; her topeke wan kîn û nefreta vî gelî li dijî dagirkeriyê zêde dike. Wê ev gavên me yên berxwdanê mezintir bike".

Li ser navê Meclîsa Kantona Şehbayê Nisrîn bal kişand ser berxwedana hevbeş a gelên Sûriyê û got; dagîrkeriya tirkî di nava du salan de sê komkujî li Şehbayê kirin. Em carek din bang li NY, saziyên mafê mirovan û yên eleqedar dikin ku li erkên xwe yên mirovî xwdî derkevin û rê li ber kuştina gelê me bigirin.



Di dawiyê de li ser navê malbata Elsekran ku du zarokên wan di encama komkujiya Til Rifetê de şehîd bûn, Bedir Sekran axivî û bi bîr anî ku piranî mexdûrên êrişên dagirkeriyê jin û zarok in. Sekran bi slogana 'bijî berxwedana gelan' dawî li gotina xwe anî û ev soz da: "Emê heta dawiyê şopdarên xeta pakrewanên xwe bin".

Hêjayî gotinê ye roja 23.1.2021'ê, dagîrkeriya tirkî li bajarê Til Rifetê komkujiyek kir. Piştî lidarxistina merasîmê, birîndarê bi navê Se'id Eldîn Qeys ku bi giranî birîndar bûbû şehîd bû. Di encamê de jimara şehîdên komkujiya li Til Rifetê li ser destê dagirkeriya tirkî û çeteyên pêk hatiye dibe 4 û birîndar jî dibin 8.

# Plana dagîrkirina Şingal û Dêrikê

Dewleta tirkî xwe amade dike ku di nava 10 rojan de êrişeke dagîrkirinê bide destpêkirin û Şingal û bajarê Dêrikê dagîr bike.

Piştî hevdîtinên wezîrê parastinê yê Tirkiyê Hulusî Akar yên li Bexda û Hewlêrê serokkomarê dewleta tirkî ya dagîrker Recep Tayyîp Erdogan pirsa rojnamevanan ya "Wê operasyonek li dijî Şingalê pêk bê?" wiha bersiv dabû: "Em her tim amade ne operasyonên hevpar bikin, lê heta ku ev operasyon neyên destpêkirin, nayên ragihandin. Gotineke min heye; "Dibe ku şevekê em ji nişka ve bên". mesele tev ev e."

Têkildarî mijarê gelek çavkanî ji ANHA'yê re axivîn û gotin; dewleta tirkî xwe amade dike ku di heman demê de êrişî Şingal û Dêrikê ya bakur û rojhilatê Sûriyê bike.

Çavkaniyan diyar kir ku wê êriş



di nava 10 rojên pêş de pêk bên, lê agahiyên berfirehtir nedan.*ANHA*

# Greva birçîbûnê di roja 61ê de bi biryardariyeke xurt didome



Greva birçîbûnê ya ji bo şkandina tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan û têkbirina zordariya li zindanan hatî destpêkirin, di roja 61p de didome û girtî di çalakiya xwe de bibiryar in.

FacebookTwitterWhatsAppTelegram

Greva birçîbûnê ya ji bo şkandina tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan û bidawîkirina zordariya li girtîgehan ya 27`ê Mijdarê ji aliyê girtiyên PKK û PJAK'ê ve hatî destpêkirin, di roja 61ê de dewam dike.

Girtî diyar dikin ku li gel zordariyê heta tecrîd bi dawî nebe wê de ji çalakiya xwe bernedin û bi biryardarî çalakiya xwe bidomînin. Herwiha bang li gel jî dikin ku li çalakiyên greva birçîbûnê xwedî derkevin.

### GREVA BIRÇÎBÛNÊ LI MEXMÛRÊ DI ROJA 40, DE YE

Li wargeha koçberan ya şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) jî li dijî tecrîda li Îmralî, bi pêşengiya jinan 18'ê Kanûnê, çalakiya greva birçîbûnê hat destpêkirin. Çalakî li Komeleya Malbatên Şehîdan ya Mexmûrê di roja 40, de dewam dike. Şêniyên wargehê di çalakiya xwe de bibiryar in û diyar dikin ku heta tecrîd neyê şkandin û zordariya li zindanan neyê rakirin wê çalakî neqede.

# 11 endamên Heşdî Şebî di kemîneke DAIŞ`ê de hatin kuştin

Di kemîneke çeteyên DAIŞ`ê ya li bakurê paytexta Iraqê de, herî kêm 11 endamên Heşdî Şebî hatin kuştin û deh jî birîndar bûn.

Êvara Yekşemê çeteyên DAIŞ`ê li rojhilatê bajarê Tikrît yê girêdayî Selahaddîn, êrişeke çekdarî li dijî baregehên Heşdî Şebî ya Iraqê pêk anîn. Ev êriş piştî du teqînên xwekujiyê yên li navenda Bexdayê pêk hat.


Têkildarî mijarê, ji efserên Tugaya 22'yan ya Heşdî Şebî, Ebû Elî El-Malikî ji AFP'ê re got; çeteyên DAIŞ`ê êrişî Tugeya 22'yan



ya li rojhilatê Tikrîtê kirine ku 150 km li bakurê paytext Bexda ye."

Çavkaniyên din yên Heşdî Şebî ragihandin ku 11 endamên wan hatine kuştin û deh kes jî birîndar bûne.

Di dawiya sala 2017`an de hêzên Iraqê çeteyên DAIŞ`ê têk biribûn lê şaneyên DAIŞ`ê hê jî li herêmên dûrî bajaran çalakiyên xwe didomînin.



## Ji bo rêveberiya Şamê desthilatdarî, yan Sêriye?

**Zekî BEDRAN**

Dewleta tikrî meleneta xwe li ser Sûriyê didomîne. Roxîneke mezin hat serê Sûriyê. Bedelên giran dan. Digel vê dewleta tirkî nasekine. Li milekî DAIŞ û El Nûsre di navê de, tevayiya çeteyên dijminên mirovayiyê di binê sêwana xwe de kom kirine, li milekî jî Idlib jî di navê de li tevayiya herêmên Sûriyê yên dagîr kirîn li hemberî gel van bi kar tîne. Çawa ku mûxalefeta Sûriyê bin wan pêşkêşî dinyayê dike. Navên weke "Artêşa Milî ya Sûriyê" li wan dike. Li hemberî artêşa Sûriyê artêşeke din ava dike. Eger hin li hemberî Tirkiyê tişteke wisa bikin wê wê qiyametê rake. Lê li ser erdê xelkê vê ji xwe re normal û maf dibîne.

Tirkiyê Ixwanî bi tevayî xistine binê parastina xwe û bi xwe ve girê dane. Vê hêzê li hemberî welatên erebî jî bi kar tîne. Halê hazir dewleta tirkî ji bo dewletên erebî tevan xeter e. Ne welatên erebî tene, di serî de Ewropa ji bo dinyayê tevê xeter e. Ji bo ku DAIŞ li ser piyan bimîne her tiştî dike. DAIŞ nemîne jî ji hêzên çekdar yên li dora xwe kom kirîn çend DAIŞ derdikevin. Li milekî wan li hemebrî Ewropa bi kar tîne, li mile din ji Libya heta Ermenistanê ji bo dagîrkeriya xwe bi kar tîne. Tirkiyeke ku ji bo aştiya dinyayê tehlûke ye li pêşberî her kesî sekiniye. Tirkiye herêmên li Sûriyê dagîr kirîn bes nabîne. Dixebite vê dagîrkeriya xwe fireh bike û aramiyê xerab bike. Ji bo wê bi mehan e herêmên Eyn Îsa û Til TEmir di binê êrişê de dihêle. Bi heman awayî li xeta Til Rifet û Şehba jî êrişên xwe didomîne. Herî dawî di topbaran Til Rifet de 2 jê zarok 3 kes şehîd kirin. 6 kes jî birîndar bûn. Jixwe li Efrînê sûcên li dijî mirovayiyê bênavber didomîne.

Rûsya di nava van bûyeran tevan de ye. Li gorî lihevkirina bi QSDê re parastina sînor girtine ser xwe. Digel ku QSDê li gorî lihevkirinê tev digere, Tirkiyê di kirina sûcan de dewam dike. Ti mafê Tirkiyê li ser Erdê Sûriyê nîne. Ti kesî Tirkiye dawet nekiriye. Bi zordariya xwe ketiye Sûriyê. Gel dikuje û dixwaze di rêveberiya welat de bibe xwdîgotin. Rûsya dikare peymana lihevkirinê dayne pêşiyê û sînordar bike. Li Rûsya li şûna wisa bike li dûv hesab û berjewendiyên cuda ye.

Li hemberî van tevan rêveberiya Şamê li kû ye û çi dike? Rêveberiya Şamê gel li ciyekî hiştiye. Hesabê wê tev li ser wî qasî ye ka wê çawa li desthilatdariyê bimîne û weke berê welat bixe binê kontrola xwe. Di rojeva wê de nîne ku li ser gel bifikire, yekîtiya welat çêke. Tikiye ji Efrênê heta Serê kaniyê sûcên pir giran dike û dagîrkeriyê kûr dike. Berî niha jî şeş zarok kuştibûn. Komkujiya dawî jî di navê de rêveberiya Şamê rexneyekê jî nake. Halbiku kuştina zarok û sîvîlan li seranserê dinyayê sûcê şer e. Diviya Şam ji bo vê qiyametê rake. Di ser de Tirkiye hem erde Sûriyê dagîr dike, hem gelê wê dikuje, hem di hedefa wê de rejim heye. Diviya Sûriye di vê mijarê de dinya agahdar bikira.

Rêveberiya Şamê li şûna ku vê bike, hewl dike ku li bajarê Qamişlo ku ewlekarê heye û gel baş xerab jiyana xwe didomîne, tevlîheviyê derîne. Hişmendiya Şamê ev e; tişta ne ji min re be, bila tine bibe. Halbiku gelên bakur rojhilatê Sûriyê û rêveberiya wê her tim dibêjin em ji bo yekîtiya Sûriyê û demokrasiyê amade ne bi Şamê re hevdîtinan bikin. Ev nêzîkatî şansê çareseriya pirsgirêkan dide. Lê rejim li şûna çareseriya mayînde li dû wî qasî ye ku birînên nû vebin û xwîn pirtir birije. Ev siyaset Şamê xurt nake û yekîtiya Sûriyê hêsan nake. Di ser de ji dewleteke weke Tirkiyê re û erdê wê dagîr kiriye dibe alîkar.

Divê rêveberiya Şamê para xwe di alozî û xerabûna Sûriyê de bibîne û bizane ku êdî hişmendiya Baasê tiştekî ku bide gelan nîne. Gelên Sûriyê jî, rejim jî di navê de divê neyên lîstika hêzên ku dixebitin wan bînin hemberî hev û di vê mijarê de şiyar bin. Herwisa divê dev ji mafê xwe yê têkoşîna ji bo demokratîk bernedin. Weke din divê ji bîr nekin ku erkê wan e ku li hemberî êrişên dagîrkeran amadekariya parastineke mezin ya şer bikin.